Ez di nav xebatê de bi gelek hevalên xebatkar û dilsoz re xebitîm , lê di nav xebata min de hinek însanên gelekî zikreş ketin nav me û berê me dan tiştê xirap ez li wê poşmanim wekî din ez li tiştêkî xwe ne poşmanim ji ber ku min ji xwe re pejrandiye ez jînek wilo bijîm û feqîrtiyê derbaskim , Ez xwedî pere bûm , xwedî siwara bûm , xwedî gund bûm tabî ew gişt çûn , Roja bera min dan ez reviyam min zanîngeh hişt , tivingek minî delal hebû ji bîra min qet narê heya ku ez xweşim pêno ya dirêj hêjayî welatekî bû birin bavê min pê ketibû gelek şera , Dabancak min hebû birin , Siwareyek me hebû pontiya heşt silindir ew jî birin.

Ez ne poşmanim yanê min wisa li ser xwe qebûlkiribû ji ber ku roja ez ketim xebatê min baş zanî ku ev tişt li benda min e.

Di rewşa xebata bi dizî de, ez neçar dimam ku xwe ji ber çavan bidin alî , wê demê rojê Sê caran Sibe , Nîvro , Evar min nanê tisî û çayê dixwar û pir caran sipiyên canê min dixwar sipî pîrbûn wê demê , Ez dihatim malina min xwe dişuşt camêra sipî ji min dukujtin , Ez li wê jî ne poşmanim.

Dîsan ez dibêjim :Tenê ez li tiştêkî poşmanim min hevaltiya hin kesan kir û ew jî ne hêjayî hevaltiyê bûn û ji ber vê yekê ez gelekî dilêşim , Lê li hemberê tiştê ku li ser min sivik dike û ez pê serbilindim ewe ku bi ez bi hevalin din re xebitîm hevalin qehreman , dilsoz , cefakêş û xebatkarên bi nav û deng bûn û ew jî

## Dûmahî : Ji Dîrokê re Hevpeyvîna Rojnameya Pêşverû bi Heval Ebdilhemîd Derwîş re

bi alîkariyên diravî partiya we ji malbat û zarokên wan re şandine wek Elî Ebdella , Mîşêl Kîlo, Silêman Şemer , Enwer Elbinî , Ekrem Elbinî , Riyad Sêf me meh bi meh pazdeh hezar didan zarokên wan ev partiya we dikir ne Ragihandina Şamê dikir.

Ragihandina Şamê miflis bû tiştêkî wê tunebû , Rojêkê min ji Riyad Sêf pirs kir : Min got ma niha perê me çi hene vaye hevalên me tên girtin û hin ji wan direvin û zarokên wan birçîne ma wilo çêdibe ya Bavê Cewad , Bi min re got wele Hemîd 3500 werqê me heye , min jêre got law kiro ma Ragihandina Şamê bi 3500 tenê dibê got wele evin pereyên me , min got keremke ji tere vaye ev nîv milyon pê karê xwe bikin , Tabî nîv milyon ên wê demê qîmetek xwe hebû.

Gotibû camêr li gelek cihan gotibû em tunebûn Partiya Pêşverû û Hemîdê Hec Derwîş em kirin Ragihandina Şamê , wilo bû bi rastî me gelekî alîkariya wan kir , Gelê Kurd û tevgera kurdî ew kirin hebûn.

**Pêşverû : Bi dirêjahiya salan Partiya me xebitiye ji bo parastina nasnameya netewî ya kurdî û taybetmendîya doza gelê kurd li Kurdistanana Sûriyê , herdem me banga Hevkarî û xebata hevbeş di nav tevgera Azadîxwaza Kurdistanê de kiriye , Komîta Hevrêzî û Bereya Kurdistanî ya ku tu serokê wê komîtê bû xwezî tu vê xalê ji xwendevanan re zelal bikî?**

**Mamoste Hemîd :** Ez bi wûjdan bibêjim partiya me bi rolekî mezin lîstîye û xebateke bê hempa kiriye di parastina gelê kurd li Kurdistanana Sûriyê , Ez vê yekê bi serbilindî dibêjim ku ne partiya me ba wê sed lîsk li ser kurdên sûriyê bimeşandana lê partiya me nehêştiye , Di her pilanekê de ku xêrnexwaz û neyarên gelê me di dermafên kurdan de xwestine bikin herdem "Partiya Pêşverû" bi mêranî li hemberê deketiye û nehêştiye ew pilan û kiryarên xirab herin serî û a herî dawiyê ew bûyerên 2004an li Cezîrê çêbûne, xwestin herêmên kurdî wêran bikin û gelê kurd tune bikin lê dîsa Partiya Pêşverû nehêşt ku ev karê xirab herê serî , Lewre hinek casûsên muxabertan digotin Hemîd kurdan kedî dikê nahêle kurd şoreşekê çêkin bi rastî xerîb bûn yanê mirov matmayî dima şoreşê çi bavê min , dixwestin kurd karekî wisa bikin da ku ji xwe re bikin behane û careke din gelê kurd tune bikin.

Ji bo hersê parçeyên kurdistanê partiya me bi rolekî bingehîn rabûye û xebateke bê hempa kiriye di piştgirîya tevgera Azadîxwaza Kurdi-

stanê de û di vê derbarê de Partiya me , Ykîfî Niştîmanî Kurdistanî Iraq , Partî Demokratî Kurdistanî Îran û Partî Sosyalîst a Kurdistanana Turkiyê em her çar me komîta hvrêziya kurdistanî çêkir û bi beşdarbûna Partiya Komonîst a Sûrî û Partiya Komonîst a Iraqî ew jî wek çavdêr bi mere bûn , Komîta Hevrêziya Kurdistanî bi rolekî baş rabû di danasîna doza kurdî li her çar parçeyên kurdistanê di nav civaka navdewletî de û bi taybetî yên sosyalîst de xwestin ku doza kurdî roj bi roj pêşde bidin û partiya me rolekî xwe ya bingehîn di nav wê komîtê de hebû ji ber ku em serokê wê bûn û me serkirdayetiya wê jî dikir , Piştî bi demekê û ji ber gelê sedeman mixabin ew kar rawestiya û neçû serî.

**Pêşverû : Peywendiyên partiya me bi tevgera kurdistanî re çawa ne û bi taybetî bi partiyên kurdistanana îranê re?**

**Mamoste Hemîd :** Peywendiyên partiya me bi hemû aliyên tevgera kurdistanî re başin û sebarek bi partiyên kurdistanana îranê re Peywendiyên me bi wan hevalan re gelekî başin.

**Pêşverû : ji destpêka qeyrana sûrî de partiya me herdem daxwaza yekrêzî û yekîtiya helwesta kurdî kiriye ji kongira niştîmanî ya kurdî û ragihandina ENKSê û piştî Desteya Kurdî ya Bilind û piştî bidawîbûna kongirê me yê çardemîn em daxwaza avakirina biryara rêzaniya kurdî li Kurdistanana Sûriyê dikin û hîn jî tevgera me pareçeye bi nerîna te sedem çine gelo?**

**Mamoste Hemîd :** Sedem gelekî û sedemek herî zêde ez dibînim nezantiya meye wek min ji tere got zemanê Ehmedê Xanî çawa nezantî hebû mixabin hîn em ji wê xelas nebûne , Lê eger çi behane û sedeman peyda bikin çênabe ku em li hev nekin û nêzî hev nebin di vê dema hestiyar û dîrokî de ya ku gelê me tere derbas dibe hêvîdarim di rojên bê de em karibin li hev bikin û karekî baş ji gelê xwe re bikin.

**Pêşverû : Di 29 / 7 / 2014an de te daxwaza hevdîtîneke şewirdarî ji aliyên tevgera kurdî û kurdistanî kir da ku li hember metirsiyên ku kurd tere derbas dibin rawestin û nakokiyên di navbera tevgera mede çareser bikin, bi nerîna te mamoste çima ew daxwaz nehat pejrandin?**

**Mamoste Hemîd :** Bi nerîna min kurd îro di qûnaxeke geleî xirab re derbas dibin ne tenê li Kurdistanana Sûriyê û hew Lê belê li Kurdistan Iraq , Kurdistan îran û li Kurdistan Turkiyê jî , kurd gelekî ji hev belabûye , Em wek Partiya Pêşverû me dît tê xwestin ku divê

## Dûmahî : Ji Dîrokê re Hevpeyvîna Rojnameya Pêşverû bi Heval Ebdilhemîd Derwîş re

**Pêşverû :** *xewna mamosteyê mezin Ehmedê Xanî Dewleta kurdî ya serbixwe tu çawa lê dinêrî û di vê qûnaxê de kurd karin dewleta xwe ya serbixwe ragihînin an na?*

**Mamoste Hemîd :** Hevalê Hişmend ez gelek vekirî ji tere bibêjim û her kurdek jî bila gotina min bibhîze : Keko îro dem ne dema ku em dewleta kurdî ragihînin , îro em karibin li her Çar parçeyên Kurdistanê mafên xwe bistînin û em wî mafî pêşde bidin hêdî hêdî em bingeheke xurt peyda bikin heya ku em Kurdistanê mezin radighînin.

Eger em xwe ji vê gavê re baş amede nekin wek niha şeweyê îro Tirk , Îran , Iraq û Sûriyê wê nehêlin em tu dewletan çêkin ji ber ku nerîna wan çanda wan rêbaza wan siyaseteke şovînî , ne mirovahî û kiryarên hovane di dermafê miletê me de dimeşînin û armanca wan ewe ku gelê kurd ji meydanê rakin û tune bikin ne ndewleta kurdî bipejrînin ( qebûl bikin ) .

Dema Ehmedê Xanî digot :

Ger dê hebûya me itîfaqek

Vêkira bikira me inqyadek

Camêr ne ji valahiyê ev gotin kirine , Lê belê wî derûniya miletê xwe naskiribû. Ez gelekî xemgînim û bi dilêşî ji te û ji xwendevanên hêja re dibêjim: Mixabin miletê me ji wê demê de pêşde neçûye û derûniya zemanê Ehmedê Xanî hîn di nava miletê me de heye , Em wek tevgera kurdî li Sûriyê heya niha em nikarin li hev rûnin û berjewendiyên doza gelê xwe gotûbêj bikin ma ev ne ji wê demê xirabtire.

**Pêşverû :** *Çiyayê Kurmênc Bûka welatê windayê , Ew şarê nazenîn li ber dilê te îro di dorpêçêke teng û dijwar de ye û gelek me-tirsî li ser hene rewşa Efrînê mamoste tu çawa lê dinêrî û çarenûsa Efrînê tu çawa dibînî?*

**Mamoste Hemîd :** Ezê wê jî bi zelaî ji xwendevanên hêja re û ji gelê kurd re bibêjim Efrîn parçeyek ji Kurdistanê ye bê gotin ( Bê teredud ) lê Efrîn parçeyek ji Kurdistanê Turkiyê ye belkî di navber wê û Kurdistanê Sûriyê ereb ketinê lê ew parçeyek ji Kurdistanê ye , Kurdistanê Turkiyê siba çêbibe wê Efrîn bi serkeve yanê Turk di wa ortê de tuneye Erebb tune , sînore ku sînore rabe Efrîn bû Kurdistanê Turkiyê , Lewre ez dibêjim : bila kesek ji ereb û tirkan dilê xwe xweş neke ku Efrîn ne bi ser Kurdistanê ve ye , Ev ne raste Lê belê Efrîn parçeyek ji Kurdistanê ye û ne dilxweş kirin lê rastî wisaye lewre bi wêrekî ez dibêjim : Efrîn pêşenga bajarên Kurdistanê ye.

**Pêşverû :** *Nerîn hene û gelek dibêjin ku*

*Efrîn wê bi paya Turka be û ji aliyekî din ve tê gotin ku wê bi ser avê keve û wê bibe paya Sûriyê tu çi dibêjî ?*

**Mamoste Hemîd :** Ez ne bi wê nerînê re me û ez wisa nabînim , Ez dibînim ku Efrîn parçeyek ji Kurdistanê ye , Ez wek însanekî kurd dibînim ku Efrîn bêrikeke ji Kurdistanê Turkiyê , Kobaniyê bêrikeke ji Kurdistanê Turkiyê û Cezîrê jî bêrikeke ji Kurdistanê Turkiyê dema ku sînore bîn rakirin ev hersê herêmên kurdî dibin parçeyekî temam ji Kurdistanê.

**Pêşverû :** *Mamoste ev demeke dirêje partiya me rêbazeke niştimanî di xebata xwe de daye ber xwe ji dan û standin bi tevgera rêzaniya sûrî re û mixabin me ziyaneke mezin ji des wan peywendiyên dît , peywendiyên te bi tevgera rêzaniya sûrî û bi taybetî "Ragihandina Şamê" ya ku partiya me bi rolekî bingehîn û çalak di wê xebatê de radibû, û tu jî wek serokê wê ragihandinê bû, Helwesta Ragihandina Şamê ji doza kurdî çibû li gor helwesta rikberiya niha ya ku hin aliyên kurdî heya roja îro di nav de mane?*

**Mamoste Hemîd :** Mirov fedî dike ku bibêje ew wek ên niha bûn "Ragihandina Şamê" ya rikber bi rastî ragihandineke niştimanî û aştîyane bû , Bi şeweyekî siyasî xebata xwe dikir , Dûrî çeka û karê çekdarî Ragihandina Şamê bi şaristanî dixebitî , Me digot emê xebata xwe bi şeweyekî mirovî û şaristanî bikin û bila rêjîm me bigre û di zîndanê ne xeme , Lê bê şer û kuştin û Emê bêjin em demokratxwazin û em xebatê dikin ji bo peydakirina heyameke Azad û Demokrat ji vî welatî re.

Me wisa dest bi karê xwe kir û em gelekî bi serketin , Me kongirekî xwe ji 163 endaman li Şamê li darxist , ji kesayetiyên gelekî bi nîrx di Sûriyê de , Em 11 – 12 kurd jî di nav wan de beşdar bûn piştî dan û stanek dirêj li ser doza kurdî piraniya endamên kongir gelekî bi camerî alîkariya mafê kurd jî kirin , piştî me karê xwe bi dawî anî gotin divê em serokekî û Du cîgirî ji nav xwe hilbijêrin, Me serokek hilbijart Fîda Elhoranî bi derket û kesayetiyekî Erebb ez dam pêş û got ez dibînim ku bila Ebdilhemîd Derwîş bibe cîgirê serokê ragihandinê , bi teziye ez bi derketim 162 kesan dengê xwe da min tenê yek ma mixabin ew jî yekî kurd bû.

Piştî Ragihandina Şamê bi rêket û baş meşîya , piştî bi demekê Fîda Elhoranî hat girtin û ji ber ku ez cîgirê yekem bûm Lewre ez bûm serokê Ragihandina Şamê partiya me jî bi serbilindahî alîkariya girtiyan dikir heya

## Dûmahî : Ji Dîrokê re Hevpeyvîna Rojnameya Pêşverû bi Heval Ebdilhemîd Derwîş re

kar bikin, man ez û Apê Osman bi tenê careke din Osman tekez kir û got Hemîd tu alîkariya min bikî emê partî çêkin ez bi tere dibêjim ez bi yên din re nabêjim min got başe ez bi tere. Me destpêkir di destpêkê de tizûkê xwe yê hundirî me danî bi Zimanê Kurdî , Di sala 1956an Dr. Nûreldîn Zaza giha me wî jî alî me kir , kesayetiyin din jî alîkariya me kirin "Mam Celal" gelekî alîkariya me kir , sekreterê Partî Dîmoqratî Kurdistanî Îran "Ehmed Tewfîq" alîkariya me kir me hêdî hêdî bernameya xwe bi dawî anî û (200) hejmar bi (200 ps) me çap- kirin û heya niha hejmarek jê li cem min heye , piştê em ketin xebatê di nav kurdên Şamê de xwendekar hebûn û ew hatin tevî me bûn pi- raniya wan ji Amûdê bûn xwendekarên Amûdê bûn hatin tevî me bûn em hêdî hêdî fireh bûn , piştê me danûstan bi xwendekarên Dirbêsiyê re jî kir ew jî hatin tevî me bûn.

Piştê hevalên Kurdaxê jî dan û standin bi mere kirin "Reşîd Hemo" ji mere şandin , Mihemed Elî Xoce , Şewket Henan , Xelîl Mihemed şandin cem me em bi hevalên Kurdaxê re jî rûniştin û em gihan encameke baş ew jî tevî me bûn hejmara me bû (7) em berê Sê bûn ez , Apê Osman û Hemzê Newêran hevalên Kurdaxê jî Çar em bûn Heft Dr. Nûreldîn Zaza û Şêx Mihemed Îsa jî bi dizî bi mere dixebitîn bêyî ku xwe xuya bikin lê bi mere dixebitîn bi vî awayî em bûn Neh em têra xwe çêbûn û wisa partiya me bi rêket û heya roja îro.

**Pêşverû : Hevalê Cegerxwîn ne bi were bû?**

**Mamoste Hemîd :** Hevalê Cegerxwîn piştê hat , piştî wê bi salekê tevî me bû.

**Pêşverû : Biryara serkirdayetiya partiya me bi vêxistina Agirê Newrozê kengî we Agirê Rizgariyê li Kurdaxê dada û wê demê tu li Efrînê bû yan na ?**

**Mamoste Hemîd :** Partiya me hate damezrandin ji bo rêxistinkirin û rêbertiya cemawerê gelê kurd û berevaniyê di ber doza netewî ya kurdî de li Kurdistana Sûriyê bike û da ku xewn û hêviyên gelê kurd di welatekî Azad û Demoqrata de pêk bîne, Lê piştî demeke kurt ji damezrandina partiya me yekîti di navber herdu welatan Sûriyê û Misirê de çêbû wê demê dest bi girtina çalakvan û xebatkarên siyasî kirin û di wê demê de hêzên istixbaratên sûrî hemû heval û dost û kadirên partiya me girtin û hevalekî me nema û zordarî nedît ji lêxistin,kehreba û kotek û îşkenceyên hovane li ser destê wan xwînmiyan dîtin, Lewre di sala 1960 de serkirdayetiya partiya me biryarek stand bi vêxistina agirê Newrozê li Sêsid û Şêst gundî

Kurdaxê da ku istxbaratên Ebdilhemîd Serac zanibin ku kurd û tevgera netewî ya kurdî ne tenê li Cizîrê ye lê belê ji wê zêdetir li Kurdaxê ye jî, ji ber vê yekê ev biryar hate standin û wê demê ez jî li Kurdaxê bûm , (Ez jî li Efrînê bûm) lê min zêde dirêj nekir ji ber ku hevalan ji min xwestin ez ji wir bi derkevim û li ser daxwaza hevalan ez ji Kurdaxê çûm Helebê.

**Pêşverû : Rewşa Sûrî bi giştî û guherînên li welêt çêdibin tu çawa dibînî?**

**Mamoste Hemîd :** Rewşa Sûriyê rewşeke xirabe Sûriyê hêdî hêdî bûye gelek welat ez bi hêvî me ku welatê me ji vê rewşa xirab bi derkeve , divê em ji destên van hêzên teror bi derkevin daku em ber bi welatekî Azad û Demoqrata de herin û em bighên rewşeke xweştir.

**Pêşverû : Tu wek damezrênerê tevgera netewî ya kurdî rewşa tevgera rêzaniya kurdî tu çawa dibînî û çî ji tevgera me tê xwestin ji ber ku doza kurdî di qûnaxek gelek hetiyar de derbas dibe?**

**Mamoste Hemîd :** Rewşa Sûriyê çawaye rewşa kurd jê xirabtire , Em ji vê rewê gelek astengiyan dibînin , kurd bûye parçe parçe aniha hinek alî di nav kurdan de hene partiya pir dikin û bi dehan partî çêbûne , Ev tiştêkî gelêkî xirabe di der mafê xebata netewî ya kurdî de , mixabin me gelekî hewilda ku em bi aliyên sereke di tevgera kurdî de "Encûmena Niştimana- niya Kurdî li Sûriyê" , "Tevgera civaka Demoqrata" , "Hevbendiya Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê" û partiya me , me xwest ku em karibin bi hev re rûnin û ders bikin da ku em nêzîkbûnekê di nav tevgera xwe de peyda bikin mixabin em bi ser neketin , rewşeke wiha nebaş di nav kurdan de peydabûye û encamên wê qet ne başin ji kurd re , Em bi hêvî ne ku di siberojê de em li hev bikin û em karibin xebateke heja ji milletê xwe re bikin.

**Pêşverû : Pêşeroja Milletê Kurd li Kurdistana Sûriyê di Sûriya Pêşerojê de tu çawa dibînî ?**

**Mamoste Hemîd :** Eger em bixwazin Sûriye bi ser xwe were çênabe ku kurd bê maf bimînin,berî partiya Bes û Ebdilnasêr bê ser desthilatdariya welêt,Sûriye gelekî demoqrata û xweş bû , piştî aliyên şovînî rêbertiya welêt kirin bi rastî Sûriyê xerabû Sûriyê bû Sûriyak şovînî mafê kurd têde nema û xwestin ku gelê kurd bihelînin , Em hêvî dikin ku ew rojên xirab herin û Sûriya pêşerojê bibe Sûriyak Demoqrata û Azad mafên gelê kurd jî têde xuya û parastî bin.

## Ji Dîrokê re Hevpeyvîna Rojnameya Pêşverû bi Heval Ebdilhemîd Derwîş re



*Ez wek hevaleyê we û wek sekreterê partî ji hevalên xwe yek bi yek dixwazim ku nebin xwediye siloganên derewan , nebin xwediye siloganên qebe û vala ,Partiya Pêşverû bimîne wek dibistaneke xebatkari ji miletê xwe re mafê kurd biparêze,hebûn û nasnameya netewî ya kurdî biparêze. Hêviya min ji xebatkaran Partiya Pêşverû ewe ku bi dilsozî û bi mêranî xebata xwe bikin û ew herdem hilgirê doza xwe ya netewî û ala kurdî bin û weke şêra di rêya xebatê de bimeşin û rêveçûna hevalên xwe bi dawî binin heya ku hûn gelê xwe ji bnidestiyê rizgar dikin û dighên mafên xwe yên netewî di welatekî Azad û Demoqrat de*

*şêst sal kar û xebat li dijî zordariyê  
şêst sal kar û xebat li dijî nezantiyê  
şêst sal xebat û berxwedan li hemerî  
kehreba û kotek û îşkenceyên hovane di  
zîndanên zordestan de, Lê bi Hişmendiya  
Dr. Nûreldîn Zaza û bi baweriyêke kûr û bi  
vîneke ji polat kar û xebata xwe berdewam  
kir û bû kelem di çavên neyaran de û hîn jî  
berdewame di xebat, û tekoşîna xwe de ji bo  
çareserkirina doza netewî ya kurdî li kurdistana sûriyê*

*Xwendevanên hêja û delal di vê hejmarê de  
xebatkarekî bi nav û deng ji buhara jiyana  
xwe de dest bi karê rêzanî kiriye û zêdetirî  
Şêst salî ji jiyana xwe daye doza netewî ya  
kurdî , Guleke bîn xweş û giranbuha ji vê  
axa pîroz , herêma bêrdar û welatê şêrîn li  
me dibe mêvan , Ew damezrenêrê tevgera  
netewî ya kurdî li kurdistana Sûriyê ye  
Sekreterê partiya me heval Hemîd Derwîş  
tu bi xêr hatî mamoste li ser seran û li ser  
çavan hatiye*

**Mamoste Hemîd :** Xêr û xweş li te spas. Di destpêkê de ez te pîroz dikim li ser vê xebata te ya hêja ez tenduristiyeke baş ji were dixwazim û serkeftineke mezin ji miletê xwe re dixwazim.

**Pêşverû :** Mamoste Hemîd jiyanêke dagirtî û ezmûnêke netewî û niştimanî ye ji kerema te mamoste xwezî tu kurte jiyana xwe ji xwendevanan re bidî nasîn?

**Mamoste Hemîd:** Ez li gundekî hatime dunyayê , ew gund jî navê xwe Qermane ew

gund li nêzî herêma Dirbêsiyê ye , Di sala 1936an de ez ji dayika xwe bûme , xwendina xwe ya seretayî min li Dirbêsiyê xwendiyê û xwendina xwe ya navîn jî min li Hesekê xwend wê demê dibistan tunebûn lewre ez û Sê pismam xwe em çûn wir me xwend pola Heftan me bi dawî kir pola Heştan em cûn Helebê wê salê me li Helebê xwend û di sala 1954an de em çûn Şam û li Şamê min xwendina xwe ya navîn bi dawî anî û li Şamê min bekeloriya stand û li Zanîngeha Şamê min beşê zagonsazyê ( Hiqûq ) xwend.

Piştê ez derbas nav karê rêzanî bûm û ji ber çalakî û xebata xwe ya rêzanî ez neçar mam ku di sala Sêyem de ez dest ji xwendinê berdîm.

**Pêşverû :** mamoste ji destêka jiyana xwe de te xebata rewşenbîrî , karê rêzanî û rêxistinî kiriye ji komeleyan de heya bi damezrandina partiya me hema bi kurtî we çawa partî damezrand?

**Mamoste Hemîd :** Di sala 1955an li Şamê me Osman Sebrî naskir , Rewşen xan me naskir gotin em karibin karekî bikin ji çanda kurdî re me got başe emê bikin , Ez û hersê pismamên min me biryar da ku em pê re bixebitin û komîta vejandina çanda kurdî me çêkir Heft pirtûk me çapkirin , piştî ku me pirtûk çapkirin rojekê Osman sebrî ji min re got Hemîd eger tu alîkariya min bikî emê partiyekî kurdî çêkin min got ma çawa em herdu bi tenê emê partî çêkin , careke din got ku tu alîkariya min bikî emê çêkin , min jî got başe ezê alîkariya te bikim , min ji hersê pismamên xwe re got wan ev daxwaz nepejrandin ku bi mere

## Dûmahî - Hişmend Şêxo: Di bîranîna (69) saliya damezrandina "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" de

meydana siyasiya sûrî de cihê xwe girt û bi taybetî di dema damezrandina (Ragihandina Şamê) de , lê piştî ku bayê guherînê bi ser Rojhilata Navîn de hat partiya me daxwaza li darxistina kongirekî niştimanî Sûrî û kongirekî niştimanî kurdî kir û di wê çarçewê de xebata xwe berdewam kir.

### Duwem : Li ser Asta Netewî ya Kurdî

Ji roja damezrandina Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê di Çardehê Cehzerana sala 1957an de xebata me herdem ji bo parastina hebûna gelê kurd û nasnameya netewî ya kurdî bû , û bi dirêjahiya salan di jiyana xwe ya xebatkariyê de partiya me berdewam bû di piştgiriya tekoşîna gelê kurd li Kurdistana Başûr , Bakur, û **Rojhilat de** , û di vê derbarê de kedkariyek mezin daye , herwiha xebatek bê hempa kiriye ji bo pêkanîna peywendiyên du alî bi tevgera Kurdistanî re li ser bingeha rêzgirtina doza netewî ya kurdî li Kurdistana Sûriyê , û herdem tekez kiriye ji bo taybetmendiya tevgera rêzaniya kurdî li her perçakî Kurdistanê , lewre Partiya Pêşverû bi dirêjahiya salan rastî gelek astengiyan hatiye û gelek êş û azar dîtine ji zordariya rêjîma dîktator li ser gelê me ji aliyekî ve , û ji ber nezantiya civaka me di wê demê de ji aliyekî din ve , lewre di gelek qonaxên xebatê de şerê me hatiye kirin carekê bi behaneyê (Markisiya Lênîni), û carekê jî di bin navnîşana (Berzanî û Berzanîzmê de) , **Tevî** ku **dij-minê** me bi tundî şerê me

dikir , lê tu carî me ji neyarên gelê xwe re negot Erê û me koletî nepejrand û me miletê xwe danexist bazarên siyasî , û li hember vê yekê li gor karîna û zanîna xwe "Partiya Pêşverû" herdem bi hişmendî xebata xwe berdewam kiriye û bi tundî li hember siyasetên tunekirin , pişavtin û dagîrkeriyê rawestiye.

Xwendevanên hêja :  
Hevalên xebatkar, dostên rûmetdar:

Em di demekê de bîranîna Şêst û Neh saliya damezrandina partiya xwe bi bîrînin û vedijînin ku pêşatên mezin li welatê me Sûriyê çêbûne û welat di rewşek hestiyar re derbas dibe û bi taybetî piştî rûxwendina rejîma Be's bi hemû simbol û ragireyên wê em tekez dikin li ser bîrîna regezpetestiyê bi şewazekî mayinde , û avakirina dewleteke demoqrat , şaristanî daku mafên hemû pêkhateyên civaka Sûrî tede parastî bin dîrî siyasetên tund û tunekirinê ya ku li ser gelê kurd û doza netewî ya kurdî dihate meşandin. Di bîranîna Şêst û Neh saliya damezrandina "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" de em tekez dikin û dibêjin "Partiya Pêşverû" wê bimîne dibistanek xebatkariyê ji gelê kurd û hemû gelê Sûrî re û bi rêbaza xwe ya hişmend û rêyalîst û pêşketî wê bimîne hilgîrê al û doza netewî ya kurdî li Sûriyê , herwiha wê berdewam be ji piştgiriya xebatê û tekoşîna gelê kurd ji Kurdistana Bakur , Başûr û Rojhilat re li gor taybetmendiya her parçeyekî Kurdistanê û li gor taybetmendiya doza netewî ya kurdî li Kurdistana

Sûriyê.

Di dawiyê de ez we piştrast dikim ku Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ne tenê partiyeke kurdî ye û hew , lê belê ew dibistaneke netewî Kurdistanî ye û partiya hemû Sûriyan e, ligel hemû kesên ku çavnebariya berjewendiyên Sûriyê dikin. Ji bo bidawîkirina êş û azarên Sûriyê û gihîştina çareseriyêke siyasî ku bibe sedema avakirina dewleteke demoqrat , nenavendî , xwedî sistemeke pir reng û pir netew. Herwiha dimîne dibistaneke xebatê ji bo pêkanîna xewn û hêviyên gelê me di Kurdistaneke serbixwe û azad de. Di vê roja dîrokî de ez endezyarên partiya xwe Mamoste Ebdilhemîd Derwîş , Mamoste Reşîd Hemo û hemû hevalên damezrêner û pêşengên ku rêya xebatê ji mere vekirine bi bîra xwe tînim û bejina xwe li ber giyanê wan diçimînim. Herwiha ez germtirîn silav û pîrozbahiyên li tevahî gelê xwe dikim û dibêjim : Erê hîn mafên netewî yên kurdî di makezagona welêt de nehatine çespendin, lê bawerî li ciye û hêvî bilindin ji berdewamiya xebatê re da ku gelê me ji dagîrkeriyê rizgar dibe û dighê mafên xwe yên netewî di welatekî Azad û Demoqrat de. Bijî bîranîna (69) damezrandina Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Serkeftin ji doza me ya dadmend re

Heleb /14 / 6 / 2026 Z – 2638 K

**\*Endamê Komîta Navendî ya Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê**

## Hişmend Şêxo: Di bîranîna (69) saliya damezrandina "Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê" de

### "Şêst û Neh sal xebat li dijî zordariyê"

Di dawiya sala (1956)an de Sê niştîman perwerên kurd (Osman Sebrî , Ebdilhemîd Derwîş û Hemzê Niwêran) yekem rêxistina rêzanî ya kurdî li Kurdistana Sûriyê bi navê (Partiya Kurdên Demoqratên Sûrî) damezrandin û hêjayî gotinê ye ku rêznama wê ya bingehî bi Zimanê Kurdî bû , û di benda wê ya çarem de wisa dibêje : "Çi gava siya koledar ji ser welatê me Sûriyê bi dûrkeve û rêya têkiliyên derve bête birrîn , P.K.D.S ji bo (400000) kurdên ku li Cizîrê , Kaniya-Ereban , û Çiyayê Kurmênc dijîn dê rêzanek taybet bixwaze , da ku mafên wan ên siyasî , civakî û zanistî di nav welatê Sûriyê de bê parastin." Piştî danûstandin bi hejmarek ji xebatkar û rewsênbîrên kurd re li Parêzgeha Helebê hate kirin hersê hevalên pêşîn û hevalên Efrînê gihan biryarekê li ser dîroka damezrandinê û hinek guhertin di navê partî û tozika navxweyî de bibe , û di Çardehê Cehzerana sala 1957an de pêşengên gelê me (Dr.Nûredîn Zaza , Osman Serbrî , Hemzê Niwêran , Ebdilhemîd Derwîş , Reşîd Hemo , Mihemed Elî Xoce , Şewket Heman , Xelîl Mihemed , Cegerxwîn , Şêx Mihemed Îsa) weke desteyeke damezrêner (Partiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê) damezrandin ji bo rêbertiya cemawerê gelê kurd û berevaniyê di ber doza netewî ya kurdî de li Kurdistana Sûriyê bike û xewn û hêviyên kurdan di wêlatakî Demoqrat de pêk bîne. Lê piştî demeke



kurt ji damezrandina partiya me yekîfî di navber herdu welatan (Sûriyê û Misirê) de çêbû wê demê dest bi girtina çalakvanên siyasî kirin û di wê demê de hêzên istixbaratên sûrî hemû heval , dost û kadirên partiya me girtin û hevlekî me nema û zordarî nedît ji lêxistin , kehrebe , kotek û îşkenceyên hovane, Lê vîna gelê kurd û hişmendiya rêbaza partiya me ji hêz û çavsoriya wan regezperestan bi hêztir bû, Lewre di sala 1960 de serkirdayetiya partiye biryarek stand bi vexistina "Agirê Newrozê" li Sêsid û Şêst gundî Efrînê da ku neyarên gelê me zanibin kurd û tevgera netewî ya kurdî ne tenê li Cizîrê ye Lê belê ji wê zêdetir li Efrînê ye jî , û Ji wê rojê de hişyarbûna netewî di nav gelê me de dest pêkir. Piştê hikûmeta jêdabirrinê bi armanca tunekirina hebûna netewî ya kurdî dest bi pirojeyên nijadperest kirin wek pirojeya amara awarte di sala 1962an de û pirojeya zî-nara erebî di sala 1966an de bi armanca peydakirina kembereke nijadperest da ku cudahiyê di navbera herêmên kurdî de li Sûriyê û Kurdistana

na Turkiyê de bike û gelek piroje û kiryarên nijadperest meşandin lê tevî wê vîna heval û xebatkarên partiya me neçelmisîn, lê belê hêzeke zêdetir da wan ji berdewamiya xebatê re ji bo parastina hebûna netewî ya kurdî û peydakirina mafên netewî yên rewa ji gelê kurd re di çarçewa dewleteke demoqrat û pir netew de , herwiha wan kiryarên şovînî nikarî bûn bandorê li ser siyaseta me ya rêyalîst û rastbîn bike , ew siyaseta ku "Partiya Pêşverû" li ser bingeha netewî û niştîmanî ava kiriye dûrî siloganên qebe , û ji ber vê yekê partiya me guhdanek taybet û girîngiyêke mezin da pêşxistina peywendiyên bi hemû pêkhatên civaka sûrî re ji ereb , suryan , kild û aşoriyan re. Di vê bîranînê de ez dixwazim xebat û helwestên "Partiya Pêşverû" li ser sê astên sereke nîşan bidim

### Yekem : Li ser Asta Niştîmanî ya Sûrî

Piştî sala (1970)de partiya me zêdetir di nav tevgera niştîmanî ya sûrî de xebitî û bi rolekî çalak di nav

## Daxuyaniyek bi babeta bîranîna (69) saliya damezrandina Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê

### Daxuyanî ji nerîna giştî re

Di Çar dehê Cehzeranê de bîranîna Şêst û Neh saliya damezrandina partiya me (Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê) li me dibe mêvan ku weke vê rojê di Cehzerana sala 1957an de hejmarek ji pêşengên kurd (Osman Sebrî, Hemze niwêran, Ebdilhemîd Derwîş, Reşîd Hemo, Mihemed Elî Xoce, Şewket Henan, Xelîl Mihemed), damezrandina wê ragihandibûn, û piştî (Şêx Mihemed Îsa, Nûredîn Zaza, Cegerxwîn) tevî refên partiyê bûn û bi hev re komîta navendî ya partiyê saz kirin, ku dan ser milên xwe bi hêzên dîmoqratî û niştîmanî yên Sûrî re kar bikin, û berpirsiyariya berevaniya di ber serbixwebûna welêt de û xebat ji bo pêkanîna mafên netewî yên gelê kurd li Sûriyê, û rûberiya siyasî yê kevneperest û pirojeyên nijadperestî yên ku hikûmetên dîktatorî yên li pey hev hatine rêbertiya welêt kirine, û bi taybetî hikûmeta jêdabirîne û hikûmeta Be's.

Û di zûtirîn dem de cemawerê gelê kurd li derdora partiyê xwe dane hev, û rêxistinên wê li hemû herêmên kurdî belav bûn, û komele û rêxistinên kurdî xwe hilweşandin û bê merc xwe tevî partiya kurdî kirin, tiştên ku hiştin deselatên nijadperest gur bikin, yên ku bijardeyên tundiyê û girtin û zîndanê di dermafê xebatkar, kadir û serkirdeyên vê partiyê de hilbijartin, û şerê wan di pariyê nanê wan de dikirin, lê partiya me ji xebata xwe ve-negeriya, û hêviyên wê neçilmisîn û vîna xebatkarên wê xurtir bû li hember siyasî yê nijadperest, û vîna partiyê û girêdana bi pîrensîbên xwe yên netewî û niştîmanî xurtir û zêdetir dibûn.

Partiya me ji roja damezrandina wê de xwedî beşdarbûneke netewî û niştîmanî bi bandor bû, û bi taybetî di dema qeyrana Sûrî de, partiya me bi şêweyekî ber-

fireh beşdarî xwepêşandanan û çalakîyên cihêreng bû yên ku li seranserî welêt çêdibûn ji nav-erasta Adara (2011an) de, yên ku daxwaza azadî û rûmetê dikirin, û bi rolekî berz lîst ji bo yekrêziya aliyên kurdî bi rêya damezrandina Encûmena Niştîmanî ya Kurdî li Sûriyê û ragihandina Desteya Kurdî ya Bilind, herwiha partiya me û bi hemahengiya digel Partiya Yekîtiya Demoqrat a Kurd li Sûriyê beşdarî saz kirina konfiransa kurdî ji yekîtiya helwest û aliyên kurdî yê ku di dîroka 26 Nîsana 2025an de li Qamişlo hatiye lidarxistin, tevî aliyên lawaziyê di lidarxistina wê de, partiya me pabende bi derçûnên vê konferansî û bi şandeya kurdî yê ku ji wî konferansî hatiye bêlikirin.

Û piştî rûxandina rêjîma Elbe's û wergirtina Desteya Rizgariya Şamê deselata li welêt, Sûriyê derbasî qûnaxeke dîrokî û nû bû, û Sûrî bi wê hêviyê bûn ku hikûmeta veguhêz wê xwen û hêviyên wan di avakirina dewleteke demoqrat nenavendî û pir reng ku dadmendî û wekhevî di navbera hemû pêkhat-eyên neteweyî û olî de peyda bike, û tiştên ku ji aliyê şerê navxweyî hatine kavilkirin ava bike, lê ew têde bi serneket. Lê di derbarê helwesta hikûmeta demkî ji doza kurdî, partiya me mersûmê (13) dît ku gaveke erênî ye û pêkane ku hin tişt li ser werin avakirin, tevî ku ew bi tevahî ne li gor xewn û hêviyên gelê kurde û pêkanîna mafên xwe yên netewî û dîmoqratî di makezagonê de nehatine, û beşdarbûna wî di pîrosêsa siyasî wek netewa Duwem di welêt de.

Bi vê babeta dîrokî hêjayî balkişandinê ye ku girîngiya tevîhev kirina berdewam, û girîngiya çibçikîrîna rêkeftina Bîst û Nehê heyva Çile, tevî ku tu tiştî girêdayî bi mafên netewî yên gelê kurd li Sûriyê, û taybetiyên herêmên kurdî (Cizîr,



Kobanî, Efrîn), û tevî ku partiya me bang û daxwaza çibçikîrîna vê rêkeftinê dike da ku rê li ber binpêkirinan bigre û daku xwîn neyê rijandin, lê di heman demê de ji hikûmeta veguhêz daxwaza têgihîştinekê dike ji vê piştguh kirina hebûna kurdî li Sûriyê weke pêkhateyeke netewî resen, û dest ji danûstandinên pêre bila ne weke dozeke rêveberî be.

Û di dawiyê de 'em ji vê rûreş kirinê nîgeranin ku hin rastiyên dîrokî yên ku weke penda kurdî dibêje: "Roj bi bêjîngê nayê veşartin". em dibînin ku hin aliyê siyasî bê maf, dîroka partiya me û dîroka damezrandina wê reş dikin, û ew di vê rojê de ahengan li dar dixin û daxuyaniyan bi vê babetê bi derdixin, tevî ku ew berî demeke nêzîk hatine damezrandin û her kes jî vê yekê zanin.

- Bijî bîranîna (69) damezrandina partiya me Partiya Demoqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê.

- Hermayîn ji pêşeng û xebatkarên pêşîn re yên ku rêya xebatê ji me re vekirine.

- Bi hev re ber bi avakirina Sûriyak demoqrat, pir reng û nena- vendî, û welatekî ku têra hemû Sûriyan bike.

/ 13 / 6 / 2026 Z - 2638 K

**Komîta Navendî ya  
Partiya Demoqrat a  
Pêşverû ya Kurd li Sûriyê**



Min digot qey tu bi zimanî  
Ma tu bi kurmancî nizanî

CEGERXWÎN

## Yekîfî Niştîmanî Kurdîstan bîranîna (69) saliya damezrandina partiya me pîroz dike

Yekîfî Niştîmanî Kurdîstan  
Nivîsgeha peywendiyên  
Beşê peywendiyên Kurdîstanî

Ji bo: Partiya Demoqrata Pêşverû ya Kurd li Sûriyê.. Rêzdar.

Bi babeta bîranîna (69) saliya damezrandina Partiya

Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê, ku weke partiyeke

dêrîn û xebatkar ji bo mafên gelê kurd li Sûriyê, em germtirîn

pîrozbahiyên arasteyî we û gelê me yê kurd li hemû parçeyên Kurdîstanê dîkin.

Ji damezrandina partiya we (Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê) de peywendiyên kûr û

xurt di navbera serok Mam Celal û rihmetiyê mamoste Hemîd Derwîş de hatin damezrandin, û vê

peywendiya bi hêz li ser heman rêbazê berdewam kir û di hemû qûnaxên xebatê de bû bîngehek

ji danûstandinê re ji bo bidestxistina mafên netewî yên gelê me li hemû parçeyên Kurdîstanê.

Baweriya Yekîfî Niştîmanî Kurdîstan bi we mezine, ku hûn rola xebata Partiya Demokrat a

Pêşverû ya Kurd li Sûriyê danekartir bikin, û çalakiyên wê yên aştiyane yên li ser rêbaza Hemîd

Derwîş zêdetir bikin, û herwiha ji bo cîbicîkirina prensîbên dîmoqrati li Sûriyê, û ji bo xizmeta doza

gelê kurd li Sûriyê.

14 / Cehzeranê / 2026

Nivîsgeha peywendiyên

Beşê peywendiyên Kurdîstanî



## Şêst û Neh saliya damezrandina

### Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê pîroz be


Bi helkefta bîranîna (69) saliya damezrandina partiya me Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû Çardehê Cehzeranê li tevahî gelê kurd pîroz dike û serkeftinê ji wan re dixwaze.

14 / 6 / 2026 Z - 2638 K



Desteya sernivîser a Rojnameya Pêşverû

Rojnameya Pêşverû Dengê milletê kurd e  
Dengê Partiya Demokrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê ye



**Rojnameyêke Mehaneyê ji Aliyê Nivîsgeha Ragahandina Efrînê ya Partiya  
Dewqrat a Pêşverû ya Kurd li Sûriyê Tê weşandin Hejmar (101) Cehzeran 2026 Z - 2638 K**

**Dengê Pêşverû**

Di dîrokê de û dema mirov rûpelên mêjû û çanda gelan dipelîne û bala xwe dide serxwebûna welatan û Azadiya gelan û li nimûne û ezmûnên gelên azadîxwaz dinêre û dide ber hev rastiyeke ji mirov re xuya dibe ku her welatek , her miletek ,her netewek ji zordariyê rizgar nabe û naqihê azadiya xwe bêyî kar û xebatê , û di heman demê de hişyarbûna her miletekî bi tevgera netewî ya wî miletî ve girêdayî ye, weke hemû gelên cîhanê gelê kurd û hişyarbûna netewî ya kurdî li Kurdistanê vedigere rojên damezrandina tevgera netewî ya kurdî li her çar parçeyên welatê me bi tevahî û bi taybetî li Kudistana Sûriyê, Lewre di Çardehê Cehzerana sala 1957an de hejmarek ji pêşengên kurd yekem rêxistina rêzanî ya kurdî li Kurdistanê Sûriyê damezrandin bi nave

**(Partiya Kurdên Dewqratên Sûrî)** ji bo rêbertiya cemawerê gelê kurd û berevaniyê di ber doza netewî ya kurdî de li Kurdistanê Sûriyê bike û xewn û hêviyên gelê kurd di welatekî azad de pêk bîne,  
Gelî xwendevanan

Ji roja damezrandina partiya me de armanca me herdem parastina hebûna gelê kurd û nasnameya netewî ya kurdî bû , lewre partiya me bi dirêjahiya salan rastî gelek dûjin û astengiyan hatiye û gelek êş û azar dîtine , herwiha di jiyana me ya partîzanî de û di gelek qonaxên xebatê de şerê me hatiye kirin carekê bi behaneya Markisiya Lênînî û carekê jî di bin navê Berzanî û Berzanîzmê de, Tevî ku dujminê me bi tundî şerê me dikir , lê tu carî me ji neyarên gelê xwe re negot Erê û me koletî nepejirand û me miletê xwe danexist bazarên siyasî , û li hember vê yekê **(Partiya Pêşverû)** herdem bi vîna gelê kurd û bi rêbaza xwe ya hişmend xebat û tekoşîna xwe berdewam kiriye ji bo azadiya gelê kurd û parastina xaka kurdî , û herwiha Partiya Pêşverû rolekî girîng dilîze di xêzkirina siyaseta kurdî de di nav aliyên Tevgera Azadîxwaza Kurdistanê de.

Bi hatina vê roja pîroz em germtirîn silavan li serkirde , heval , dost û xebatkarên partiya me dikin û cejina tevahî gelê kurd pîroz dikin.

Bijî bîranîna **(69)** saliya damezrandina partiya me  
Serkeftin ji doza me ya dadmend re

**Desteya Sernivîser a Rojnameya Pêşverû**

**Rûpelin ji dîrokê  
Rêzname bingehîn a partiya me**

<p>RÊZNAME A BINGEHÎ P. K. D. S.</p>	<p>RÊZNAME A BINGEHÎ P. K. D. S.  1956</p>
<p>2) P. K. D. S. partiyeke azadiperest [1] û pêşverû (2) ye. Ji lewre ji bo welatê xwe Sûriye rêzaneke dewqrat û gelêr (3) çak dibîne. Ji bo pêkanî û danîna rêzaneke holê , û parastin û firehkirina serbestiyên dewqrasî bi hemî kes û partiyên pêşverû re tevkariyê digire ser xwe.</p> <p>3) P. K. D. S. ji bo welatê xwe Sûriye serxwebûneke tikûz dixwaze. Di vê rê de Partî bi navê Kurdên Sûriye şerrê Kolidar û noker (4) ên wî dike.</p> <p>*1*Azadiperest. Di ramdana xwe de azadî, mîteherîr. *2* Pêşverû. Yê ku çav dide pêşveçûnê û qîna xwe bi li paş mayîne nîne, teqetdîmî. *3* Gelêr. Ji gel, gelparastin ji bo gel kirin. *4*Noker. Kole ,xulam, dâvik .</p>	<p>RÊZNAME BINGEHÎ</p> <p>1) Hêya iro tinebûna rêyeke rast û durust li pêş Kurdên Sûriye, ew ji hev xistine û ji hemî heqên siyasî, civakî[1] û zanistî bêpar hiştine. Li pêş vê rastîya tehlî û dijwar, hin Kurdên welatparêz ji bo parastina birayên xwe ên Sûriyê ji şaşî, sitem û wînda bûnê, bi navê «Partiya Kurdên Dewqratên Sûrî» Komelek anîne pê.</p> <p>(1) Civakî - İctimai</p>

**Rojnameya Pêşverû**



**Ev Rojname Rojnameya we ye  
Ev Deng û Hawara we ye  
Zengîn bikin bi gotarên xwe  
Ev xewn û Hêviya me ye  
Hişmend**